

Navê Cihan, Mekanên Bîrê û Geliyê Zilan di Çanda Dengbêjiyê de

Ömer DELİKAYA¹

Dengbêjlik Kùltüründe Yer Adları, Hafıza Mekânı ve Zilan Deresi

Öz

Kendine has ses ve icra biçimleri, geçmişte yaşanmış olayları bir sözlü tarihçi edasıyla aktarmaları, aşk, kahramanlık, yoksulluk ve göç gibi izlekler etrafında çeşitlenen geniş repertuarlarıyla dengbêjler, geçmişten günümüze sözlü Kürt kùltürünün önemli taşıyıcıları olmuşlardır. Dengbêjlerin sözlü şiirleri sayılan ve genellikle enstrüman olmadan icra edilen kıamlar, Kürtlerin toplumsal hafızasında önemli bir yere sahip olan hadiseleri konu edinir ve bu hadiselerin korunmasında ve gelecek nesillere aktarılmasında büyük bir rol oynarlar. Bu çalışma sözlü Kürt kùltürünün önemli dengbêjlerinden Reso'nun (1902-1983), seslendirdiği "Geliyê Zilan" ile Nuroyê Meter'in (1941-2020) icra ettiği "Keremê Elî" adlı kıamlar üzerine odaklanmakta, bu her iki kılamda yer alan yer isimlerinin işaret ettiği kùltürel ve tarihsel temsilleri ortaya çıkarmayı amaçlamaktadır. Her iki dengbêjin bu temsiller yoluyla mekânsal hafızayı canlı tutmaya, unutmaya karşı güçlü bir anlatsal direniş oluşturmaya çalıştıkları tespit edilmiş, böylece kıamların salt şiirsel bir anlatı olmaktan çıkıp bir tür alternatif tarihsel anlatıya dönüştükleri gözlemlenmiştir. Dengbêjlerin icra ettiği kıamlarda sıklıkla yer alan ve sembolik anlamları ile öne çıkan yer adlarının anlatıdaki önemine değinen bu çalışma, aynı zamanda Nora'nın "hafıza mekânları" [lieux de mémoire] kavramı çerçevesinde kıamlarda yer alan yer isimlerinin hafıza ile ilişkili bir tür sözlü/sembolik anıtsal mekâna dönüştüklerine ve bu sayede geçmiş mekânsal imgelem yoluyla hatırlatma gücüne ulaştığını ifade etmektedir. Çalışma kapsamında multidisipliner bir yaklaşımla ilgili iki kılamın konu ve içerik analizine katkı sağlaması açısından Zilan ile ilgili yapılan sözlü tarih literatüründen istifade edilmiş ve Zilan sonrası toplumda doğal olarak gelişen anma amaçlı isim değıştirme (commemorative place naming) eyleminin tarihsel olayları hatırlatma fonksiyonu tartışılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Dengbêj, kılam, hafıza mekânı, hatırlama, Zilan

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakùltesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatı, omerdelikayaa@gmail.com, ORCID: [0000-0001-6505-5107](https://orcid.org/0000-0001-6505-5107).

Kurte

Dengbêj bi deng û şêwazên xwe yên taybet, fenanî dîroknasên devkî ji repertuarên xwe yên berfireh ên li dor babetên cihêreng ên wekî evîn, şer, qehremanî û hwd. qewamên giring ên raboriyê vedigêrin û bi vî karî ew dibin hilgîrên herî berçav ên çanda devkî ya kurdî. Kilam, vegêrana helbestî ya dengbêjan xwedî wê şîyanweriyê ne ku gewherê wan qewaman biparêze ku ew di bîra civakî ya kurdî de bi giringiya xwe berçav in û wan bîne destedewrî nîşên siberojê bikin. Ev xebat bala dilê xwe berdide ser kilama “Geliyê Zîlan” ya Dengbêj Reso (1902-1983) û kilama “Keremê Elî” ya ku ji aliyê Dengbêj Nuroyê Meter (1941-2020) ve hatiye îcrakirin û temsîlên çandî û dîrokî yên herdu kilaman derdixe mexderê ku bi nav û nîşanên erdê ve hatine nitirandin. Di çarçoveya van herdu kilaman de ev xebat balê dikişîne ser giringiya navên cihan ên di vegêranên devkî yên kurmancî de ku gelek caran di kilamên dengbêjan de cih digirin û bi wateyên xwe yên sembolîk derdikevin pêş. Dengbêj bi rêya nîşan û temsîlên mekanî hewl didin ku hafizeya li dor mekan avabûyî zindî bihêlin û li hemberî kiryara jibîrkirinê berxwedaneke xurt a vegêranî biafirînin, bi vî rengî kilam ji vegêraneke helbestî ber bi dîrokbêjîyê dijber û alternatîf vediguherin. Herwiha ew destnîşan dikin ku cih û warên bi rengekî di kilaman de cih digirin, rengvedanên rastiya civakî vedigêrin ku ew wekî ‘mekanên bîrê’ [lieux de mémoire] qewama raboriyê bergewde dikin. Ev mekanên bîrê ne tenê rê û rêkarên alternatîf ên bibîrxistinê pêşkêş dikin ku civat bi wan bi rengekî berxwedêr lê dixebite ku raboriya xwe ya hevpar bi cemawerî bi bîr bîne, ew herwiha bi bîrê re têkildar, nav û îşaretên mekanî, ango ‘kilamxane’yên sembolîk/devkî ava dikin ku meriv dikare di dewsa mûzexaneyan de bihesibîne. Di çarçoveya xebata berdest de, bi nêrîneke multîdîsîplîner ji bo ku tevkeriyê li nîrxandîna naveroka herdu kilaman bike ji lîteratura dîroka devkî ya derheq Zîlanê de hate istifadekirin û piştî Zîlanê kiryara ji nû ve binavkirina hin der û deveran bi amanca bîranîne (commemorative place naming) û fonksiyona vê navguhertîne ji bibîrxistina qewamê hate nîqaşkirin.

Peyvên Sereke: dengbêj, kilam, mekanên bîrê, bibîranîn, Geliyê Zîlan

Placenames, *Lieux de Mémoire* and Zilan Valley in Dengbêj Tradition

Abstract

Dengbêjs are among the most important representatives of Kurdish verbal art, with their unique sound and performance styles, their ability to record and transmit past events as oral historians, and their wide repertoire diversifying around themes such as heroism and love. The kilams, improvised or orally transmitted poetic narratives across generations, are typically performed without instruments and play an important role in transferring social memory. In this article, two Kurdish kilams, namely ‘Geliyê Zîlan’ performed and recorded on the cassette by Dengbêj Reso

(1902-1983), and ‘Keremê Elî’ which is on the same topic performed by Dengbêj Nuroyê Meter (1941-2020) are investigated in the context of the power of place names to evoke the memory of traumatic past. It was argued that oral narratives employed spatial representations to preserve the memory while creating an effective narrative resistance towards the act of forgetting. As a result, it turned out that the kilams evolved from a pure poetic narrative into a counter-historical narrative against official state discourse. This study touches on the importance of place names in the Kurdish oral narratives, which are frequently included in the kilams performed by dengbêjs, and points out that the place names in the kilams turn into a kind of verbal monument related to memory and examine social power toponyms to evoke the past, within the framework of Nora’s concept, ‘realms of memory’ [lieux de mémoire]. On this basis, Kurdish oral tradition serves to encode social, cultural and historical meaning on the space and place names create and act as the place of memory in the kilams. In addition, while our research benefits from recent oral history studies about Zilan to contribute to the content analysis of the aforementioned kilams, it also refers to the popular practice of commemorative place naming related to places of memory. Keywords: Dengbêj, kilam, memory, lieux de mémoire, Zilan Valley.

Extended Abstract

The paper presents reflections on the memorial heritage of Kurdish oral tradition with the help of ‘realms of memory’ [lieux de mémoire], a concept developed by Nora to explain the places where memory resides or is negotiated, with two selected Kurdish kilams (dengbêj’s songs) one performed and recorded on the cassettes by Dengbêj Reso (1902-1983), the other which is on the same topic performed by Dengbêj Nuroyê Meter (1941-2020) both of which are recorded performances of several decades ago. There is great progress in the studies regarding Kurdish dengbêj oral tradition, especially in the last two decades. However, the lack of academic interest in different dimensions of these non-fictional, counter-historical oral narratives is yet evident. Kilams, orally transmitted narratives across generations, play an important role in conveying the Kurdish social memory through the verbal performances of historical events and love stories. Why do dengbejs place such a heavy emphasis on the names and symbols of Kurdish geography and narrate them in their oral poetry? Can we assess these specific locations and spaces in the narration as commemorative practices which serve as lieux de mémoire that vocally and physically represent the social reality created by the presence of the past? This study aims to explore frequently narrated place names in kilams, which have the power to evoke spatial memory with a particular emphasis on narrative resistance they produce against the act of forgetting the traumatic event, namely Zilan Valley. The recitation of a group of place names of Zilan Valley functions as spatial narratives for commemorating the traumatic event. Following names, like “Zozane Sûtê, Kaniya Didara, and Delavê Herîşoyê...” which are frequently repeated in the kilam named “Geliyê Zîla”, not only recall past images of Kurdish pastoral life in terms of their nominal meaning

but also it serves like locations and sites of memories in the minds of the audience since they play an important role in commemoration of people and embody historical events of the past. The singer laments for the victims of Zilan Valley register their memories in the collective memory so that “as long as the world exists” (heta dinya xweş ava be), we should not forget the pain people suffered. According to Nora, the functions of places of memory are “to stop time, to block the work of forgetting, to establish a state of things, to immortalize death, to materialize the immaterial” (1989: 19). In their kilams, the dengbêjs take responsibility for keeping the memories of the victims of Zilan Valley alive and express the crime of forgetting in their kilams so that they would never be forgotten. In doing so, they use narrative art to honour those who were the victims of violence. Meaning they include the topic of remembrance or “crime” of forgetting in their kilams. Dengbêj Nuroyê Meter conveys his role of reminding of victims in a didactic way and says, “those who believe in God / will never forget the pain [wound] of Zilan Valley” (herçî ku dîn û îman ji bonê hebe / tu car ji bîr nake birîna Geliyê Zila). With a multidisciplinary approach, we benefit from oral history literature about Zilan to contribute to the content analysis of the aforementioned kilams. Another objective of this study was to investigate place names changed by the people of the region which can be asserted as memorial purposes. Popular commemorative place names like “Newala Fedê” (Valley of Shame), “Ada Xeydê” (Shore of Missings), etc., challenge the act of forgetting and create a counter-memory narrative against official state narratives. Further research is needed to explore different narrative dimensions of Kurdish oral tradition regarding memory, identity, power structures and space. With a multidisciplinary approach, this study benefited from oral history literature on Zilan. It was used to contribute to content analysis of two kilams and discuss popular commemorative place naming naturally developed among the people of region after Zilan.

Destpêk

“herçî ku dîn û îman li balê hebe,
tu car [ji] bîr nake birîna Geliyê Zîla”
Dengbêj Nuroyê Meter

“*Geliyê Zîla, Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê*”.² Ev risteya ji navan bendek ji kilama “Geliyê Zîla” ye ku Dengbêj Reso dibêje. Dema ku meriv guh li kilamê didêre, navên wan cih û warên ku li dû hevdu rêz dibin bala meriv dikişînin. A rast, rêze-navên bi vî rengî yên gund û waran di kilamên dengbêjan de gelek caran tên dîtin. Ew navên jorê yên benda kilama Dengbêj Reso navên gund û deverine li Geliyê Zîlan û derdora wê ya dût/nêzîk e ku qismek ji wan deverine biçûk (*microtoponym*) temsîl dikin ku ji aliyê kêman kesan ve tên naskirin. Bi rastî ev navên di kilamê de ji aliyê wateyên xwe yên peyvî ve çendî pastoral û xweş bin jî, qewama ku di kilama jorê de li ser navê wan cih û warên ji bo guhdaran tê neqilkirin, ew çend ne xweş e. Eger em li pirsra jor a ser egera vegêrana navan vegehin: Gelo bo çî dengbêj wiha qewî zêde li ser nav û nîşanên erdnîgariya kurdî hûr dibin û wan di nav form û qalibên taybet ên kilaman de li dû hev rêz dikin? Gelo ew cih û war bi rengekî kelamî û kilamî rengvedanên wê rastiya civakî venagêrin ku pê qewama raboriyê wekî *lieux de mémoire* (mekanên bîrê) ava dibe?

Amraz û qalibên vegêranî yên di naveroka kilamên dengbêjan de cih digirin, di pêkhatina kilaman de xwedî rol û fonksiyonên cuda ne. Kilam ji xêncî malûmatên li ser qewamên dîrokî, civakî û siyasî an jî têkiliyên merivî, nav û nîşanên cihêreng û zanyariyên derheq malbat û ‘eşîran de jî pêşkêş dikin. Yek ji wan zanyariyên ku di nav kilamên dengbêjan de zêde xuya dibe nav in. Dengbêj, dema ku kilama xwe çêdike an jî dibêje, pê re zanyariyên toponomîk û topografîk jî pêşkêş dike ku îşaretê bi qewimînên raboriyê yên li ser cografyaya çandî dike. Di heman wextî de dengbêj di dema performansê xwe de, zanîna xwe ya toponomîk a li ser dorhêla mekanên kilaman –çî nêzîk û çî dût- di dîwan û dawetan de destedewrî civakê dike û wan dixê nav sîrkulasyoneke dewamdar û guherbar. Ji ber vê hindê, kilam dibe amrazek ku pê toponîm û topografyaya kurdî di nav civakê de tê belavkirin û fêrkirin (Delikaya & Ertekin, 2021: 16) û herwiha ew di devê dengbêj de dibe wekî amrazek nasyarkirin û xêzkirina nexşeya xeyalî ya kurdî (Hamelink, 2014: 132; Hamelink & Barış, 2014: 46).

Vekolera qada cografyaya çandî Nuala Johnson (2004: 325) destnîşan dike ku kêman xebat hene li ser rehendê *aural* û devkî yên bîrê, lewma rola muzîk, stran

² Di amadekirina vê gotarê de bi awayên cuda alîkariya gelek kesan gihîştê min. Di serî de dixwazim spasîya Dr. Adnan Çelik, Dr. Ayhan Yıldız û Dr. Zafer Açar bikim ku halê pêşîn ê vê gotarê xwendin û pêşniyaz û şiroveyên xwe bi min re parve kirin. Herwiha Halil Akgül di rastnivîsê de û Hanîfî Taşkın jî di kontrola bernivîsandina kilama “Keremê Elî” de alîkarî bi min kir, mala herduyan ava be. Wekî dawî dixwazim spasîya hakemên nenas ên Mukaddimeyê bikim ku bi pêşniyazên xwe rê li ber min xweş kirin.

û çîrokbêjîyê ya di hişyarkirina bîra civakî de dikare ji bo vekolînên siberojê bibe rêyeke berdar. Ev xebat wê amancê dide ber xwe ku taybetmendî û fonksiyonên nav û mekanên kilaman ên hişyarkirina bîrê destnîşan bike û rola navan a di avakirina mekanê bîrê de hûr bibe di çarçoveya du kilamên bijartî de. Lewma, wê îdiayê radigire ku vegêranên devkî yên dengbêjan ji perspektîfên vegêranî yên cihê cihê *lieux de mémoire* (mekanên bîrê) ava dikin; cih û warên kuştîyan ku kilam wan wekî “qesabxane” bi nav dikin, di nexşeyên zihnî de raber dikin ku civat bi saya serê wan “mekanên bîrê” bi regekî raboriya hevpar tîne hafa bîra xwe ku “li wir bîra çandî krîstalîze dibe û xwe li nihênîyê datîne” (Nora, 1989: 7). Vegêranên devkî yên ku behs û babeta wan qewamên raboriyê yên sereke ne, di navbera civaka kurdî û raboriya wan a dûr û nêzik de pêwendiyêke xurt û dewamdar dirust dikin, bi qewlê Pierre Nora *lieux de mémoire* ava dikin. Ev mekanên bîrê herwiha rê û rêkarên alternatîf jî bi xwe re pêşkêş dikin ku civat bi wan bi regekî berxwedêr dikeve wê hewlê da ku raboriya xwe ya hevpar bi cemawerî bi bîr bîne û nehêle ku ji bîrê biçê. Serbarî ser, dengbêj di nav vegêranên xwe de babeta jibîrkirin û bibîranîyê jî tîne ziman, bi vî rengî ew rola xwe ya bibîrxistinê carinan bi awayekî dîdaktîk di kilamên xwe de radigihîne.

Kilamên li ser serhildana Agiriyê û Zîlanê qewî zêde ne. Folklornasê kurd Ordîxanê Celîl destnîşan dike ku wî di navbera salên 1951-1973yê de 14 stran li ser Serhildana Araratê û lehengên wê ji devê heşt dengbêjên başqe başqe tomar kiriye ku ji dewletên cihê yên wekî Sûriye, Ermenistan, Qazaxistan û Qirgîzîstanê bûne (Celîl, 2023 [1985]: 38). Ev yek jî nîşan dide ku kilamên li ser serhildanê ji sînoren netewe-dewletan derbas kirine û di navbera erdnîgariyêke gelek berfireh û ji hevdu dûr de li dor hizir, xeyal û kesiretiyan bîreke hevpar ava kiriye. Dîsa derheq heman babetê de Mehmet Gültekin (2020: 173) dibêje ku wî tenê di heqê berxwedana Araratê de bi qasî 60 kilam ji dengbêjên Serhedê berhev kirine ku qismek ji wan li ser lehengên sereke yên serhildanê hatine derxistin ên wekî Biroyê Hesîkê Têlî, Ferzende Beg, Xalis Beg Memo û Nadir Beg, Hisê Beko, Edoyê Ezîzî, Reşoyê Silo û Zeyno, Şêx Zahir û Hedê, Seyîdxan, Elîcan, Tewfîq, Evdîlhemîd. Di çarçoveya vê xebatê de zehmet e ku meriv bala xwe berde ser korpûseke ew çend berfireh. Ji bo sînorkirinê, ev xebat du kilamên derheq Zîlanê de dide ber xwe. Ji van kilaman yek kilama bi navê “Geliyê Zîlan” e ku Ömer û Şahin (2019:48-49) ji ber kasêteke Dengbêj Reso bernivîsandiye³ û ya din jî kilama bi navê “Keremê Elî” ya Dengbêj Nûroyê Meter e (Dengbêj Şakîrê Kopê, 2018) ku ji aliyê me ve hatiye bernivîsandin. Ji nav hewzeke berfireh a kilaman, me ev herdu kilam hilbijartin çunku kilama bi navê “Geliyê Zîlan” ji aliyê vegêrana xwe ve giştî û panoramîk bû û digel vegêrana li dor şexsan hewleke temsîlî ya qada qewamê radixist ber çavan, beramber vê, kilama “Keremê Elî” ku li ser çîroka takekesî ya Keremê Elî hatibû derxistin derfetek dida ku meriv ji du berdiyên (*perspective*) cuda li vegêranên devkî yên li ser heman qewamê binêre: yek qismen cemawerî û ya din jî qismen li ser şexsekî. Ev kilamên dîrokî ku “derûniya millet nîşan didin” yên li ser Gîldaxê û

3 Ömer û Şahin kilam wekî “Geliyê Zîlan” bi nav kirine, lêbelê di naveroka kilamê de nav wekî “Geliyê Zîla” derbas dibe ku awayê rast jî ew e. Di vê xebatê de terciha me “Geliyê Zîlan” e.

Zîlanê “hêjayî baldariyeke taybetî ne”, ji ber ku ew “ji bilî protestoyeke eşkere ya civakî û siyasî” ji bo nîzama civakî jî giring in (Celfil, 2023 [1985]: 39).

1. Geliyê Zîlan, Trawma û Bêdengî

Geliyê Zîlan ku ji bo vê xebatê, mekanê sereke yê kilamên navborî ye, geliyekî kûr û bi dar e ku ji Çiyayên Eledaxê heta Erdîşê ji çemên biçûk, rêzegundên li dor gelfî û zozan û bilindciyan pêk tê. Gelfî di nav civakê de bi gelemperî bi zozanên xwe yên xweş û bi çavkanî û çemên xwe yên sar tê naskirin. Herwiha navê vî geliyê kûr di kilam û serhatiya dirêj a bi navê “Huso û Nazê” de jî derbas dibe û ji ber vê kilama navdar di nav civaka Serhedê de ev dever cihekî naskirî ye.

Zîlan, herçiqas ji aliyê pêgeha xwe ve ji Çiyayê Agiriyê (Gîlîdax) dûr bê xuyanê jî di cewher de pêwendîdariyeke wê ya xurt bi Serhildana Agiriyê re heye. Di birêkûpêkxistina serhildanê de rola Xoybûnê heye. Xoybûn du sal piştî serhildana Şêx Seîd, ji aliyê wan kurdan ve ava dibe ku piraniya wan ji Tirkiyeyê sirgûn çûne binxetê (Alakom, 2020: 16). Wê hingê gelek kesên sirgûnkirî û qaçax xwe li Kîrrê Gîlîdaxê digirin û li wir dimînin, bere bere hejmara kesên ku li serê çiyê û derûberê wê dimînin zêde dibe. Xoybûn pêşengî û serpereştiya wan kesên li Agiriyê dike û serhildanê bi rê ve dibe ku di navbera salên 1927-1930î de bi maweyeke dirêj dikudîne (Alakom, 2020: 16). Ber bi dawiya Serhildana Agiriyê, tesîra şerê ku çend salan li Kîrrê Gîlîdaxê berdewam e, bi liv û tevgerên qaçax û serhildêran ên li herêma çiyayî ya Tendûrekê pêde pêde ve herêmê jî dixê bin tesîra xwe. Piştî şerê ku êdî xwe digihîne Erdîşê, çend gundên Zîlanê dikevin ber operasyonên leşkerî di bin serpereştiya Dewrêş Begê de. Di serî de Edoyê Ezîzî û hevkarên wî yên serhildêr (bi gotina xelkê deverê, qaçax) li Geliyê Zîlan serê qereqola Çaxirbegê jê dikin (Gültekin, 2020) û dû re herçiqas beşdariyeke çalak a xelkê medenî di serhildanê de tunebe jî xwecihên deverê dibin qurbanîyên şidetê.⁴

Hin gund piştî Zîlanê jî ji nû ve şên nabin û kavlên wan jî êdî nema xuya dibin. Jixwe, ev herêm bi qanûnê nêzîkî bîst salan tê qedexekirin. Bi sedan kes ber bi rojavayê Tirkiyeyê ve tên sirgûnkirin û di Dadgehên Îstîqlalê de tên darizandin û ji wan 31 kes tênê bidardekirin. Wê demê darizandina wan kesan (hem ji Zîlanê hem jî ji Agiriyê) di rojnameyên wê dewrê de jî xuya dibe. Hejmara 28ê Mijdara 1931ê ya Rojnameya Cumhuriyetê de wiha dinivîse: “Ji şakiyên Agiriyê, darizandina 700 kesî wê ve hefteyê li Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê dest pê bike” (Gültekin, 2020: 16). Hin ji wan kesên ku dikevin hepsa Edeneyê ji ber nexweşiyên cihêreng dimirin. Hin malbat jî ji Geliyê Zîlan cîguhastî dibin û diçine gund û bajarên cuda ên Serhedê û li wan deveran bi cih dibin. Piştî wextan, dema Demokrat Partî tê hikûmetê, Adnan Menderes efû derdixe û herêm bi qismî be jî ji xelkê re tê vekirin. Dû re di sala 1982yê de, piştî ku Kenan Evren bi derbeya leşkerî tê hikûmetê, ji Pamîra Efxanistanê qirgizan tînin li gundê bi navê Ulupamirê bi cih dikin (Gültekin, 2020:

4 Ne tenê li Zîlanê li deverên din jî şidetê rûda, bi taybetî di salên destpêkê yên avakirina Komara Tirkiyeyê de, ji bo xatirê avakirina netewe û nasnameyeke xwerû tirkî bikaranîna şideta sembolîk û fîzîkî, diyardeyeke melûm e. Bo zêdetir agahiyên li ser vê babetê bnr. Üngör, 2016.

16). Hîn jî hin xwecihên herêmê nikarin vegerin ser milk û eraziyên bavûkalên xwe, bi tapûyên xwe ve dawaya axa xwe dikin, dixwazin ku heqê wan bê teslîmkirin û hesabê “êsr”ên gelfê bê pirsîn (Gültekin, 2020; 2022). Çavkaniyên ev çend deh salên dawî yên li ser Zîlanê, paşxane û têkildariya wê ya bi Agîriyê û bi vegêranên devkî û bi belge, diyarî çav dikin ku meriv dikare zêdetir agahiyên di heqê Zîlanê de wergire (bnr. Ulugana, 2012; İşler, 2015a, 2015b; Alakom, 2020; Gültekin, 2020, 2022).

Kilamên li ser Geliyê Zîlanê, di nav vegêranên devkî yên kurdên Serhedê de xwe digihînin dereceyê bilind, bi dehan dengbêjan bi kilam û meqamên xwe ev trawma û “birîn” li hevdu vegevandine. Di nav civaka giran a dengbêjên Serhedê de kêmbê dengbêj hene ku kilamekê li ser Zîlanê negotibin. Piştî Zîlanê civat zêde trawmatîze dibe. Hin şênî û şahidên Zîlanê xwe davêjin ber bextê bédengiyê û naxwazin serhatî û şahidiya xwe bînin ziman. Jixwe di qewamên mezin ên trawmatîk de carcaran bédengî dibe yek ji wan tercîhên şahidên qewamê. Kesên ku tercîha wan li ser bédengiyê ye, li gorî Laub (1995: 64) diqewime ku bibin “qurbanîyên bîreke deforme”. Laub destnîşan dike ku ev “venegotin” a wan piştî wextan ji dewamdariya zordariyê re xizmetê dike. Di bibîranîna bédeng de qewam her ku diçe deforme dibe û bi berbelavî jiyana rojane ya mexdûran diherimîne û dagir dike. Çîrok çiqasî bédeng dimîne, ewqas têgihîştina mexdûran a derbarê wê de deforme dibe, ev yeka tê radeyê wisa ku mexdûr derbarê rastîbûna tiştên ku hatiye serê wan dikevin şik û şîbhê (Laub, 1995: 64).

Bédengiya ku li ser civakê tesîr dike, bi vegêranên dengbêjan tê şikestin ku xwe dispêrin şahidiya wan kesên ku ji mirinê filitîne an jî bi awayekî bûne şahid. Bi vî rengî, bi saya serê dengbêj, qêrîna hundurîn a wan kesên bédeng bi rengê wisa tê vegêran ku li çamikalên welat herkes bi wî dengî dihise. Kilamên dengbêjan bi taybetî yên li ser qewamên berçav di cewher de helbestên devkî yên şahidiyê ne û ew piştî wextan dibin “anonîm”⁵. Wate, xwediyê kilaman gelek caran di nav civata dengbêjan de tên zanîn û naskirin. Meriv ji vî aliyê ve li rehendê afirineriya şexsî ya kilaman binêre, meriv dikare wan wekî helbestên devkî yên şahidiyê bibîne. “Helbestên şahidiyê”, di rewşên têkildarî qewamên zêdegaviyê yên trawmatîk de gazî dilê insên dikin da ku xwe ragîre, bi bîr bîne, bibihîze û hest bi hovîtî, komkuji û îhlalên mafên merivan bike (Blumenfeld, 2011: 71).

Li aliyekî din, helbet tu metn, vegêran an jî kilam nikare bi xweşikî serboriya trawmatîk a mexdûran vegêre ji ber ku mexdûr “bê zar û ziman” dimînin. Dori Laub li ser trawmayê dibêje “têra xwe peyv an jî peyvên rast nînin serborî tu carî bi temamî di hizir, bîr û xeberdanê de nayên qefaltin” (1995: 63). Lewma, Laub vê rewşê wekî “bêmkaniya vegotinê” (*the impossibility of telling*) (1995: 64)

5 Kilamên dengbêjan piranî berhemên afirînerî yên şexsî ne ku ji hewza hevpar a qalibên kilaman istifade dikin, lê bi demê re gelek ji wan kilaman, eger xwediyên wan nav û mexlesa xwe lê wan zêde nekiribin di nav deryaya bêpîvan a kilamên kurmançî de ber bi anonîmbûnê rêya xwe dikudînin û pê re jî pir varyant ji wan diseridin. Ji ber ku devê pêş û paş nabe yek ango her cara ku dengbêjek kilama xwe tegera dike, bi rengêkî cuda wê vedigêre û varyantek çêdibe.

pênase dike ku carcar şahid bi salan nikarin wê tiştê vebêjin ku wan bi çavê serê xwe dîtiye. Lêbelê, di xala şikestina bêdengiyê û bêîmkaniya vegotinê de hunera dengbêjiyê dikeve dewreyê û serboriyên bêdengên bin tesîra tade, tirs, trawma û desthilatê de bi hunerî bi deng dike û rê nade ku ew tehekkûma xwe li ser bîra hemû civakê belav û qayîm bike. Herwiha dengbêj dihêlin ku şahidiyên takekesî yê ku bûne kilam bi kesine din re bîna vegêran û berbelavkirin, bi vî rengî rêça bavûkalan a raboriyê jî tê şopandin. Antropologê maroî Linda Tuhiwai Smith (2021), di kitaba xwe ya *Decolonizing Methodologies* de balê dikişîne li ser giringiya jî nû ve şop-gerandina rêça kesîretî û trawmaya bavûkalan. Ew destnîşan dike ku kiryarên kolektîf û pratîkên jî nû ve şopandina rêça trawmayê meriv bi raboriyê re rû bi rû dihêlin û qedr û qîmetê dide kesîretî û wêrekiya bavûkalan, bi vî karî, pakbûna kolektîf (*collective healing*) şopandina rêça trawmayê dihevine ku ev rêç bi bedenî, ruhî û bi hestî zehmet e, beramber vê qewî zêde fêrker û bi şahî ye (Smith, 2021: 196). Tiştê ku Smith behsê jê dike zêdetir di çarçoveya gerên fîzîkî de pêk tê ku meriv diçe serdana mekanên bîr û trawmayê dike, lê tiştê ku kilam bi serboriyên trawmatîk re têkildar di hest û rihê guhdaran de pêk tîne bi heman fonksiyonên wê gerê radibe û bi heman rengî kar dike. Çunku ev gerên xeyalî an jî kilamî dişibe wan gerên ku tê de bi renegekî hevpar rê û rêça serboriyên trawmatîk ên bavûkalan bi deng û his tîna şopandin; meriv ne tenê nêzîkî tecribeyên bavûkalan dikin, herwiha ew jî mîrata trawmaya bavûkalan re bi tedawî û pakbûneke hevpar dibexşînin.

2. Kilam, nav û lieux de mémoire

Kilam navê giştî yê vegêrana dengbêjan e ku hem di kurmancî hem jî di zazakî de bi heman wateyê tê xebitandin (ji bo nîqaşên têkildarî pircuretiya vê termînolojiyê bnr. Çaçan, 2013: 45-55; Kardaş, 2018: 48-49). Wekî “cureyê neçîrokê (*nonfictional*) kilam bi renegekî adetî wekî şahidiya takekesî tîna çarçovekirin û qewamên dîrokî jî berdiya kesekî an jî ji ya çend kesan tîna vegêran” (Schäfers, 2019: 453). Meriv dikare gelek sebaan rêz bike ku di çekirin û peydabûna kilaman de xwedî tesîr in: daxwazên taybet ên ji kes an jî xizmên wî kesê ku hatiye kuştin, daxwaza vegêrana meseleyên sereke ên ji raboriyê ku civak ji guhdariya wan kêfê distîne û pê re eleqedar dibe, afirîneriya civakî û qabiliyeta şexsî ya kesê dengbêj û hokarên din ên çandî, polîtîk, malbatî, eşîrtî û şexsî.

Gelek taybetmendî û dînamîkên kilamên dengbêjiyê (bnr. Aslan, 2022) ku hene ku nav û nîşanên mekanî yek ji wan e. Bi qewlê Ordîxanê Celîl navên erdnîgarî yê gund, çem û zozanên ku şer lê diqewime, exlebî tîna tomarkirin û navên lehengên sereke “tîna di merkeza dengbêjan de ne” (2023 [1985]:38). Wate, dema ku dengbêjek dixwaze kilamekê çêke, berê pêşîn navê şexs û cihan ji wan kesan dixwaze ku ji dengbêj dawaya kilamderxistinê dikin. Bo nimûne, rojekê kal û pîreke xelkê Vartoyê gazî Dengbêj Huseyno dikin û ji wî daxwaza kilamekê dikin da ku li ser lawê wan ê kuştî bibêje. Tekane kurê wan ê ku navê wî Heyder e, wê hingê eskeriya xwe temam dike û tezkereya xwe hildide ji bo ku here cem dê û bavê xwe. Heyder li Enqereyê jî aliye tirkêşçiyîyan ve tê kuştinê ji ber ku wê demê polêsek li

Vartoyê ji aliyê çepgirî ve hatiye kuştin. Dê û bavê Heyderî tî ji Dengbêj Huseyno re dibêjin “devê min lingê te”, “em in li dinyayê kurekî me heye” tu yê kilamekê li ser derxî. Dilê Dengbêj Huseyno zaf bi wan dişewite, piştî ku meseleyê guhdarî dike ji bo kilamçêkirinê ji malbatê van pirsan dike: “Mi go navê kurikî çi bû? Go navê kurê mi Heyder, navê bavê wî Elî, navê diya wî Kewê, navê xuşka wî Fatme. De îcar bira Huseyîn ji we ra bêje ka çi dibêje” (Osman Taş-Muşîya, 2022, 1:25). Ev qaîdeya ku dengbêj hurgiliyan ji daxwazkerê kilamê dike qaîdeyê geşî ye û tenê bi vê nimûneyê re sînorkirî nîne. Dengbêj Elfesîya (Polat) dema ku li Îranê bo çend mehan girtî dimîne, nebiyekî Simkoyê Şikakî ji wî daxwaza kilamekê dike û Elfesîya jî ji wî evreng pirsan dike: “Navê kalikê xwe, *bölga* [herêm] ku lê hatiye kuştinê, navê du heb pîrek, mesela jin da (!). Jin di kilaman da navê wan neyê gotinê, kilam nayê gotinê. Îca dema min jê ra kilam derxist ket xwe ve çû” (Pêwendîya Şexsî, Nîsan 15, 2022). Ji van herdu nimûneyên jorîn jî ron û eşkere ye ku di derxistina kilaman bi xwe de jî fonksiyoneke vegêranî ya navan heye. Ev fonksiyona navan di heman demê de derfetên kêrdar ên vegêranên cihêreng dide dengbêj da ku ew bikare bi rêya wan vegêranên nerasterast (*reported speech*) hunera xwe ya devkî pêşkêş bike (bnr. Sharifi & Barwari, 2020).

Di kilaman de meriv bi rihetî ferq dike ku bal û berdiya vegêranê dema ku tê pêşkêşkirin, qewama raboriyê li ser mekan bergewde dike. Bi rastî ji bo vegêranên devkî ên kurmancî navên cihan xwediyê hin rol û qalibên taybet in ku hindêk ji wan xasî zimanê kurdî ne. Bo nimûne, navên cihan ên kurdî di nav kilamên dengbêjan de qalibên cihêreng ên vegêranî û çarçoveyî yên destpêkî saz dikin. Yanî, ji mêj ve hin qalibên (*formulas*) bi navê cihan çêbûne ku bi van qalibên hazir ên ku nav di wan de guherbar in kilam hatine derxistin (bo qalibên navên cihan, bnr. Delikaya, 2021: 161-176). Herwiha, di hin kilaman de dîsa bi navan re têkildar diyardeya topojeniyê (*topogeny*) xuya dike ku li seranserê çandên li dinyayê di nav kêman civakan de peyda dibe. Ev têgeh an jî nûpeyva ku ji aliyê Fox (2006) ve hatiye pêşxistin ji bo wan vegêranên devkî tê pêşniyazkirin ku di wan de navên cihan bi awayekî seredorî rêz dibin. Di kurmancî de, di kilama “Elî Xarza” de û di kilamine din de bi awayekî seredorî navên bi dehan gundan hevterîb digel rêza pêkhatina qewamê rêz dibin û ev rêzkirina navê gundan nîşan didin ku “qewimînên dîrokî yê li dor dîrokbêjîyêke toponîmîk tî vegêran bi awayekî mekanî li ser nexşeyên devkî diedilin û çî dema ku destedewrî nifşên nû dibin nexşeya wê qewimînê û çîroka wan lehengên kilamê ji nû ve li ser mekan xêz dikin” (Delikaya & Ertekin, 2021: 23). Herwiha navên cihan nixrên nasnameya kom û cemawerê nîşan didin, dikarin gelek zanyariyan destedewrî nifşên nû bikin ku bi bîra hevpar û têkiliyên civakî û siyasî yên raboriyê re têkildar in.

Bi geştî di nav wan kilamên li ser Zîlanê de gotareke berxwedêr û dijber xuya dibe ku li “dijî bîra fermî” ya bi destê desthilatê tê avakirin, “bîreke hevpar ya alternatîf” (Tosun & Kardaş, 2022: 64) tê pêşkêşkirin. Herwiha ev “bîra civakî” ku hemû wan vegêranên gelêrî yê kurdî jî dixê nav xwe “dikare bibe amrazek ku pê koma bindest li hember temsîlê serdest û fermî yê raboriyê li ber xwe bide” û berê kom û cemawera bindest bide çalakîyên civakî û di heman demê de

nasnameya cemawerê ya dijber bide berdewamkirin ku di bîrên cewêlek⁶ (*subaltern*) de veşartî ne (Jonhson, 2004: 320). Lewma meriv dikare bibêje ku “kilamên dengbêjîyê (...) helwest û libersekinîneke wisa ye ku li ser “stratejîya dijberîyê” û li ser “pratîka berxwedêrîyê ya takekesî û civakî” ava ye (Zeraq, 2020). Bîra dijber (*counter-memory*) îşaretê bi pêkhatina wê bîra civakî û berxwedêr ya cemawerên jibîrbûyî, tepeserkirî an jî derekekirî dike ku li hemberî gotarên fermî yên desthilatê li ber xwe didin. Êdî di mekanên bîrê de an jî di pratîkên vegêranî û perfomansî de “berxwedanek di navbera bîrê û jibîrkirinê de” tê dîtin ku “di navbera wan kesên ji trawmayê rizgar bûne û hêzên serdest de pêk tê” (Edkins, 2003: 230). Bi kiryarên vegêranî û performatîf ên dengbêjan ve muzîka kurdî ya gelêrî cografyaya kurdî tevli vegêranên dîrokî û civakî dike, di rewşên qewamên li dijberî desthilatê de lê dixebite ku gotareke xurt a berxwedêr ava bike da ku di sekl û şemala gelêrî ya estetîk de kirasekî dijber ê polîtîk li xwe bike.

Îcar, dema repertuara dengbêjan tê bernivîsandin, meriv bi rihetî dikare li wê panoramayê temaşe bike ku bi referansên nav û nîşanên wan qewamên giring dagirtî ne û nêzdîroka kurdan a civakî û siyasî radixin ber çavan. Li ser vê panoramayê ya ku xwe dispêre çanda devkîbûnê gelek çar “mekanên bîrê” [*lieux de mémoire*] (Nora, 1989) ava dibin ku şahidiyê li qewama trajîk dikin û raboriya hevpar a civaka kurdî hişyar dikin. Têgeha “mekanên bîrê” a ku Pierre Nora bi pêş xistiye, ew mekan e ku bîra neteweyî wê derdixe meydanê an jî bi simbolên xwe ve wê dinitirîne. Ev mekan, çêdibe mekanên abîdeyî (*monûment*), arşîv an jî simbol bin, herwiha çêdibe wekî diyardeyên razber bin ku ji aliyê fîzîkî re xuya nabin. Nora têgeha xwe wiha şirove dike:

Eger têgeha *lieu de mémoire* xwediyê pênaseyeke fermî bûya, wê hingê divê wiha bûya: heyîneke giring e herçi bi xwezaya xwe maddî an jî ne-maddî ye, ku bi vîn û îradeya merivan re an jî bi karkirina demê re dibe hêmaneke simbolîk ya mîrasiya bîranînê ya kom û cemawerekê. [...] Têgeha berteng cext biribû ser mekan: amanc ew bû ku mekanên giring derxe meydanê da ku navendên bîranîna neteweyî yên berçav û muhim destnîşan bike û bi dû re hebûna wan girêdanên nexuyayî eşkere bike yên ku wan hemûyan bi hevdu re girê dide (Nora, 1996: XVII).

Têgeha Nora, îro ji bo qadên cihêreng tê xebitandin, nexasim jî li wan cih û warên ku ji bo bibîranînê avahiyên fîzîkî lê hatine çêkirin. Li vir mesele ev e ku bîranîn dikare bi gelek awayan were bidestxistin. Bi gotîneke din, tenê avahî, merzel, mûzexane an jî materyalên din ên fîzîkî-yên ku pîrî çar piştî wextan têne çêkirin- nabin mekanên bîranînê, lêbelê wekî ku Nora jî pêşniyaz dike ji xeynî cih û warên fîzîkî, heyînen ne-şênber (*non-tangible*) ên wekî pîrozbahî, merasîm û rituel⁷ jî dikarin bibin pareke mekanên bîrê yên ku atmosfera raboriyê bi saya serê wan tê parastin (Hoelscher & Alderman, 2004: 349). Rehendên dewamdar û guherbar ên demê dikevin dirûvê hin dîrok û qewamên simbolîk ku bi îcra û rituelên civakî bi

6 Dilawer Zeraq “cewêlek”ê ji bo têngîha subaltern/madûnê pêşniyaz dike ku wî ji Osman Sebrî deyn kiriye, bnr. Zeraq, 2022: 64.

7 Ji bo hêza bibîranînê ya “govend”a kurdî, bnr. Fernández, 2022.

rêya mekanên bîrê tîn derbirîn. Amanca wan cih û mekanên bîrê dibe “daxwaza bibîranînê” û herwiha ew dixwaze “demê bide rawestandîna û nahêle ku karê jîbîrkirinê bê pê” (Nora, 1989: 19).

Muzexane, abîde, goristan, peyker, qad, kolan û hwd. gîşt dikarin bibin mekanîna bîrê (bnr. Till, 2003: 297). Mekanê ku şer lê qewimiye, meriv lê hatine kuştin û bûye “qesabxane”, li vir bi wezîfeya goristanekê radibe ya ku kêlên wê xuya nakin, beramber vê, temsîl û pratîkên wê yên vegêranî bi rêya navan jê re dibin “kêl” (Delikaya, 2021). Jixwe bîranînên me bi navê mekan ve girêdayî tîn hafa hişê me û jixwe nav ji roleke eslî dilzîn di avakirina bîr û nasnameyê de (Çelik, 2017). Bi gotîna din, êdî “erd bi xwe wekî mekanê bîrê kar dike, nav û vegêrana qewamê ku bi rêya wan em xwe digihînin bîrê di demê de şikestinê çêdike û bi me dide tecrîbekirin”, ji ber ku tu peyker an jî muzexane ji bo wan nehatine avakirin da ku wan bîne bîra civakê (bnr. Silva, 2022: 194). Jixwe desthilateke civaka kurd ji nîne ku bikare peyker an jî muzexaneyekê ava bike û wê wekî vegêraneke neteweyî pêşkêş bike ku li dor bîra civakî bi rengekî fîzîkî ava bûye. Êdî, ev vegêran “kirîyara edebî ya herî rasterê û ya herî sabit a bibîranînê ye. Bi vê wateyê, ew ji bo kesên kuştî dibin abîde (*monument*), abîdeyên ku ji aliyê şingirên heval û eqrebayên xwe ve hatine avakirin” (Hymes, 1999: 209–210). Lewma, di destên civakê de, ji deng û bêjê pê ve kêr derfet dimînin. Ji ber vê hindê, ez pêşniyaz dikim ku em van vegêranan wekî *peykerên kilamî* an jî di dewsa mûzexaneyan de wekî *kilamxane* bihesibînin ku mekanên bîrê bi nav û nîşan temsîl dikin. Helbet ev wekî mûzexane an jî peykerên fîzîkî li eynî cihî nînin, ji ber ku ew di nav civak, dem û mekanan de digerin û tîn vegêran. Bi vî rengî şûnpiyên raboriyê navê cihan mîna “amraza desthilata bavûkalan” (Basso, 1996: 101) kar dikin ku derfetê ji me re dabîn dikin ku em xwe bigihînin zanîna bavûkalan a li ser tecrûbeyên raboriyê û pê re jî wan hemû kesan bînin bîr û dema xwe ya niha.

3. Sûcê Jîbîrkirina Zîlanê û Vegêrana “Qesabxane”yê

Kilamên bi Geliyê Zîlan re têkildar ên xwedî babetên cihêreng sînordar bin jî, hejmara kesên ku ew kilam îcra kirine gelek zêde ye.⁸ Çawa ku di destpêkê de jî

8 Bi rastî gelek kilamên li ser Geliyê Zîlan dikarin di nav hewza rêze-kilamên li ser Serhildana Agiriyê de bîn hesabandin û nirxandin, ji ber ku herdu qewam û lehengên qewamê hin hevpariyên nîşan didin. Bi taybetî têkildarê Zîlanê gelek dengbêjan kilam gotine ku hin ji wan ev in: Dengbêj Fîlîtê Axtêpe, Dengbêj Şakiro, Dengbêj Reso, Dengbêj Evdirrehmanê Perê, Dengbêj Mele Fîlîtê Wanê, Dengbêj Kazoyê Garîsa, Dengbêj Mistefayê Cangoranê, Dengbêj Ehmedê Hêlîksan, Dengbêj Nûroyê Meter, Dengbêj Mihemedê Canşah, Dengbêj Huseynê Farê û Dengbêj Apê Bekir, Dengbêj Enwer, Dengbêj Şibliyê Çaçan, Dengbêj Kekê Îsa, Dengbêj Kerem Santor û yd.. Ji bilî wan, Gültekin (2013) jî hin kilamên li ser Zîla bi defter kirine; “Ferman e” (317-318), “Geliyê Zîlan” (330-331), “Keremê Elî” (334-335), “Reşoyê Silo û Zeyno” (324-327). Hêjayê bibîrxistinê ye ku meriv bibêje ku hin dengbêj an bûne şahid an jî di biçûktiya xwe de li Zîlanê ji mirinê filîfne. Bo nimûne, gundê Dengbêj Evdirrehmanê Perê jî li Zîlanê bûye û ew hê dema ku bebik bûye bi tevî malbata xwe ji wir koç kirine û çûne aliyê Mûşê (bnr. Söylemez, 2021: 34-40). Herwiha li gorî agahiyên ku Hecî Ehmedê (Çekici) birayê Dengbêj Nûroyê Meter an jî Mele Nureddîn dide malbata wan ji eslê xwe ji Geliyê Zîlan e, ji wir koç kirine û li Dutaxa Agiriyê bi cih bûne. Bavê wî û du apê wî çaxa “siyaseta geliyê Zîla” de ku gelî tê “birrînê”, di erdê de cih vedidin û xwe vedîşêrin, bi vî rengî ji Zîlanê difilitin (Pêwendiya Şexsî, Gulan 11, 2024).

hate îfadekirin, bona vê xebata berdest ji wan koma kilamên li ser Zîlanê du heb hatin neqandin ku di nav kilamên Zîlanê de kilamine naskirî û xwedî varyant in: Kilama “Geliyê Zîlan” û kilama “Keremê Elî”. Li vir çiqas ji dest hat nixandî di çarçoveya kilamên hîlbijartî de hatiye sînordarkirin, lêbelê nixandineke kûrdîrêj dikare agahîyine nû ji wan hemû kilaman derxîne ku li ser Zîlanê hatine gotin/çêkirin. Kilama Geliyê Zîla ya li jêr ji aliyê Dengbêj Reso ve hatiye gotin wiha wiha ye:

Dayê dayê dayê...

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye li ser eşîra **Geliyê Zîla**

Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê

wey la reben im lawo îro nizanîm sebeb kî bû, kê bi kê kir

kula Xwedê bi kul be têkeve mala doquzincî alayê

firqa waliyê **Bazîdê** Dewrêş Beg pê ra

Mihemedê Hesê Hecî Elî li kaviliya **Sarisuyê** kuştin

Şêx Tahir dayê rûniştin di heqê **Geliyê Zîla** da fesadî kir

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**

kuştina tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer

Dewrêş Begê ûrt û ocaxê xwe li dunyayê qelandî lawo

derbek li tazoxlanê mala Şero daye Efê delalî

ji bona xelekek zêr e eza hêsîr im tiliya Ûsiv Begê delal di ber da jê kir.

Hacê digo Huco Fêrîdê lawo sibe ye qalek çêbiye ser eşîra **Geliyê Zîla**

Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Dîdarê, Delavê Hêrîşoyê

reben ez im lawo qewimiye li orta herdu rêyan e

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**

kula Xwedê bi kul be têkeve mala doquzuncî alayê

firqa waliyê **Bazîdê** Dewrêş Begê pê ra

Mihemedê Hupê Hecî Elî li kaviliya **Sarisûyê**

Şêx Tahir dane pêşiyê ji êvar da ez hêsîr im lawo

devê topan û tometîkan û mawîzerya li hêsîrê **Geliyê Zîla** girêdane

heyfa mi nayê li qira **Geliyê Zîla**, kuştina tazoxlanê Mala Şêro

heyfa mi nayê li wê heyfê zarê di serê sungûya da şûrê di qirika jina da

heyfa mi nayê li wê heyfê, heyfa min tê li wê
 Derwêş Begê ûrt û ocaxê xwe ji dinyayê qelandiye
 hezar û pêncsed nifûsê **Geliyê Zîla** tov kiriye ji êvar da
 biriye li orta **Kindûk** û **Milkê** di nav da kirin qesabxane
 Hacê digo Huco Fêrîdê lawo ez nemînin ji kê ra
 nizanîm bigîrîm ji halê kîjan eşîrê ra
 ez nemînîm ji hêsîrê **Geliyê Zîla** ra
 le hela felek mala te mîrat biye kê ji te ra digo
 Hacê Huco Fêrîdê her sê xweyînga sax bihêl di binê cendeka da
 bira bimîne ji derdê dunyayê ra lawo
 ezê îro ji xelkê **Geliyê Zîla** ra bêjim hêsîrê, hêsîrê, hêsîrê
 lawo bi şevê royê ez hêsîrê tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer
 gula xorta û Efê delalî ez bixwe me felek hey wêl wêl (Güneş & Şahin, 2019:
 48-49)

Di kilamên kurdî de, çarçove û qalibên vegêranî hene ku di cureyê kilamên şer de di destpêkê de cih digirin. Ev kilam jî mîna wan kilaman bi vê qalibê dest pê dike û berê pêşîn navê wan cih û mekanaan dide ku qalek lê cîriyaye. Lêbelê ji hin kilaman cudatir, ev kilama Dengbêj Reso ya li ser Geliyê Zîlan di serê ser de rêze-navên gund û deverên qewamê li dû hevdu tev li vegêranê dike. Di temamiya kilamê de, tevî hemû dubareyan bîst û pênc navên cihan –hêmanên mekanî- derbas dibin.

Navê Cihan	Navê Şexsan
Geliyê Zîla (11)	Hacê
Warê Salih Begê (2)	Huco
Zozanê Sûtê (2)	Ferîde
Kaniya Dîdarê (2)	Dewrêş Beg
Delavê Hêrîşoyê (2)	Bavê Mizefer
Bazîd (2)	Efê
Sarisû (2)	Mihemedê Hupê Hecî Elî
Kindûk (1)	Şêx Tahir
Milk (1)	

Helbet mekanên bîrê ne tenê ev der in⁹ ku di kilamê de tîn behskirin, lêbelê îmkan vegêranê ya kilamekî jî bi xwe re sînordariyê tîne. Di kilamê de mekanê herî sereke yê bîrê “Geliyê Zîla” derdikeve pêş, ev nav bi temamî yanzde caran tê dubarekirin. Herwiha, piştî ku nav û nîşanên mîna “Geliyê Zîla”, “Warê Salih Begê”, “Zozanê Sûtê”, “Kaniya Dîdarê”, “Delavê Hêrîşoyê” tê dayîn, “Doquzincî Alay” û “Dewrêş Beg”, wekî berpîrsiyar û fail, Şêx Tahir (Şêx Taho)¹⁰ di kilama Keremê Elî de jî Îdrîsê lawê Cewar Efendî an jî carcar wekî Îdoyê Cewo (Îşler, 2015b:658) an jî bi navê xwe yê fermî Gidîkzade Îdrîs (Ulugana, 2013: 48) derbas dibe, wekî muxbîr û mîllîs tê îşaretkirin û deximandin. Navên din ên şexsan, pîrranî navên wan merivan in ku bi rengê bûne qurbanî an jî şahidê kesîretî û karesatê. Jixwe, kilamên bi vî cureyî yên ku li ser kuştina kesekî tîn vegêran ku Bretêque (2012) di xebata xwe ya li ser şînên di nav êzidiyên Ermenistanê de wan wekî “kilamên li ser” bi nav dike, dema di çarçoveyê dijberiyê de rû didin, bi gelemperî li ser vegêraneke dualî ya başî û xerabiyê ava dibin ku li aliyekê lehengê baş, li aliyê din lehengên xirab (bo kilama berdest, Dewrêş Beg, Şêx Tahir, Îdrîsê lawê Cewar Efendî) cih digirin (Kaynar, 2018: 92). Dîsa jî meriv dikare destnîşan bike ku bergeha dengbêj a esasî ber bi Geliyê Zîlan ve ye, li wir, bal û zêna vegêranê bi rengê gurr li ser meknan dicive û fokûs diçe ser cih û warê ku qewam pê tê temsîlkirin. Ev mekan êdî dibe cihekî wisa ku temsîl û vegêranên derheq wî de ji bo civakê dibin xwediyê wate û bîranînan ku bi qewlê Halbwachts meriv bêje:

Mekan şopa civakê, civak jî şopa mekan hildigire. Yanî, hemû tevgerên civatê dikare bi çemkên mekanî bê tercimekirin û mekanê ku ew lê dihêwire, ji lêkciwandîna hemû çemkan pêk tê. Her layenên mekanê, her teferuata wê xwediyê wateyekê ye ku tenê ev civak dikare fêhm bike çunku her beşa mekanê ku ji aliyê civakê ve hatiye dagirtin, beramberî binyad û layenên cuda yên emrê wê civakê bi xwe ye, qet nebe ji bo wan kesan wisa ye ku di civakê de bêhtir bi îstîqrar in (2017: 142).

Bi gotina Halbwachts “bîreke hevpar” nîne ku “di nav çarçoveyê mekanî de” bergewde nebûbe (2017: 153). Rêya bîrê di wî mekanî re derbas dibe ku ji bo civakê xwedî wate ye û ev mekan jî di nav vegêrana kilamê de bi nav û nîşanên xwe tê hafa bîra merivan. Vekolerên di nav gelên xwecih ên Papua New Guineyê de dixebitin li ser fonksiyona “navên cihan” destnîşan dikin ku ew “ji bo qewamên dîrokî yên merivan” wekî bîrand (nîmonîk) kar dikin ku tînin wan meknan tekane û binirx dikin (vgz. Helleland, 2012: 110) û herwiha ew dikarin tiştine sembolkî bi bîra merivan bînin (Basso, 1996; Feld, 1996; Fox, 2006). Bi heman rengî, Connerton jî erka nava bîranînê (*memorial*) tîne ziman û destnîşan dike ku “navê cihan ne tenê şan û nîşana erdê destnîşan dikin, ne jî ew tenê mîna nîşanderan tîn bikaranîn da ku pozîsyonên di danûstandinên civatî de mizakere bikin” (2009: 10). Herwiha

9 Herçiqas ev gotar wekî mekan li ser van herdu kilaman hûr bibe jî, gelek deverên din jî hene ku lê kuştin pêk hatine.

10 Şêx Tahir, digel gelek kesên din ên muxbîr ku cihê niştecihên xwe veşartî eşkere dike, di kilamine din de jî tê deximandin: “Eva şerê par havînê li Bilanixê kê û kê kir / Şêx Taho mixbûriya Mala Şero kir” (Gültekin, 2013: 330). Dengbêj dexmekê (stigmatê) dide ser xerabiya Şêx Tahir ku di kuştinê de bûye hevkarê desthilatê. Li ser “deximandinên berdeham” ên kilamên kurmançî bnr. Çelik (2015).

nav mîna qûç (keloşk) û îşaretên mekanî kar dikin ên ku di asta bîr û hafizeyê de meriv û mekanan di nav jiyana civatî de digihînin hevdu (Delikaya, 2021: 197). Ev mekanê xwecih ê ku di vegêranê de timî caran derbas dibe, bi nav û nîşanên nasyar ên zimanî ve dagirtî ye, pevgirêdaneke hestî bi civakê re çêdike, bi taybetî bi wan kesan re ku mekan û merivên navborî nas dikin an jî ji mezinên xwe serhatiyên wan bihîstine. Bi vî rengî, ew nav dibin bîrxistên peyvî û kilamî yên qewamê ku her cara tîna vegêran mekanên xwe bi bîr dixin (bnr. Basso, 1996; Oliveira, 2009). Li Tirkiyeyê ku pratîka navguhertinê xwe gihandiyê asteke bilind a wêranker navên kurdî ne xwedî statuyeye fermî ne, ew bêyî ku bikevin bin siwan û rewabûna fermîbûnê, bi rêya vegêran û afirandinên kurdî yên devkî berbelav dibin (Delikaya, 2021: 226). Ev navên kurdî û ermenî ku bi rêya çanda devkî tîna veguhastin û vegêrandin, li dijî wê teqşîmata îdarî û îdeolojîk a ku ji jor ve tê empozekirin, tesewira kartografîk a civakî nîşan didin (Yüksel, 2019).

Di kilama bi navê “Geliyê Zîlan” de ji sehneyên şer sûretên trajîk jî dikevin nav vegêranê. Hesteke xurt bi tevî dîtbariyeye ku dilê meriv dişewitîne tev tîna pêşkêşkirin. Zîlan bi temamî wekî mekan dibe cih û warê bibîranînê. Di vê xalê de dengbêj balê dikişîne ser kuştina komî ya di navbera gundên Kindûk û Milkê de ku zîqa vegêranê ser wê jî hûr dibe. A rast, tenê ev mintiqaya berteng nabe navenda qewamê, gund û deverine din jî hene. Lêbelê derfeta ku di kilamekê de bi destê vegêr/dengbêj dikeve, dihêle ku ew li dû hevdu neh navan rêz bike ku du heb ji wan gundên **Kindûk** û **Milkê**¹¹ ne ku bûne “qesabxane”. Ev terîfa xwemalî ya di kilamê de ji bo wê qadê tê gotin ku şîdeta tunekirinê lê qewimiyê:

hezâr û pêncsed nifûsê **Geliyê Zîla** tov kiriye ji êvar da

biriyê li orta **Kindûk** û **Milkê** di nav da kirin qesabxane

Xebatên li ser dîroka devkî ya Zîlanê ev çend salên dawî zêde dibin. Herçend êdî îroka ji bo bidestxistina şahidan zaf dereng be jî van xebatan xwe gihandiyê hin şahidên dawî ên qewamê (Ulugana, 2012; Gültekin, 2020, 2022). Ulugana destnîşan dike ku Milk û Kindûk du navendên sereke ne ku hejmareke zêde meriv lê hatine kuştin.¹² Li gorî wî, kesên ku ji gundan tîna komkirin li gundê Milkê tîna kuştin (2012: 125). Bi heman rengî, Gültekin (2020) di xebata xwe ya li ser dîroka devkî ya bi navê *Şahidekî Komkujîya Geliyê Zîlan Tahir Nas* de, bi şahidê Zîlanê, Tahir Nas re hevpeyvîn kiriye ku ew bi xwe ji kuştina topasî/komî ya di navbeyna gundên Kindûk, Milk û Sarkoyê de bi birîndarî difilite. Dîsa gelek şahidên din jî, bi heman rengî ev herdu gund wekî mekanê qewamê salix dane. Herwiha piraniya şahidan bi heman rengî behsa van herdu gundên navborî kirine û tiştên ku ew li wan bûne şahid neqil kirine (bnr. Gültekin, 2020: 97, 88, 107, 115, 135; 2022: 56, 63, 82, 104). Çawa ku Taş (2022: 21) destnîşan dike, xebateke li ser dîroka devkî û vegêraneke devkî ya ku li ser heman babetê tê avakirin, dikare bi hin ferqên biçûk nêrîna giştî ya cemawerê nîşan bide. Ji ber vê yekê “nirxandina vegêranên devkî yên kurdî

11 Navê van herdu gundan bi tirkî Kündük û Mülk e. Du gundên Geliyê Zîlayê ne ku hatine şewitandin û hilweşandin.

12 Hejmara kesên ku li Zîlanê hatine kuştin bi nîqaş e, bnr. Daratî, 2023: 110.

nêrîneke bêhempa pêşkêş dikin ji bo lêkolînên dîrokî yê derheq kurdî û kurdan de” û ev yek derfetê dide ku meriv valahî û kêmasiyên dîroknivîsîna fermî ya akademîk jî bibînin (Yüksel, 2023: 136). Lewma ji gelek aliyan ve kilam bi detay û rastgotiniyê, qewamê bi dîrokbêjîyê neqil dikin ku meriv dikare wê bi xebatên sehayî yê dîroka devkî (Ulugana 2012; Gültekin, 2021) an jî bi belgeyên nivîskî ve (bnr. Yüksel, 2015, 2023; Çağan, 2013; Aras, 2018 [1996], Kaplan, 2023, Subaşı, 2023) jî piştrast bike.

Kilam tenê cih û mekanê qirê destnîşan nake helbet herwiha ew li ser fail û mexdûrên şîdetê terefgiyaya xwe ya exlaqî ligel masûmiyeta sîvîlan tîne ziman. Lewma, fonksiyoneke esasî ya kilamên li ser Zîlanê jî *bîbîrxistin* e. Îcar bi silqî serê dengbêjan qewam her cara ku di nav civakê de bi rengêkî hunerî tîna vegêran qewamê *tînin bîra civakê* û îmana cimaetê dixin gumanê li ser *sûcê jîbîrkininê*. Li vir xala herî balkêş ev e: dengbêj rasterast di kilamê de peyamekê li ser jîbîrnekirinê radigihîne û îmanê bîra wan kesan dixê da ku ji bîr nekin. Li ser vê babetê meriv dikare du varyantên kilama “Keremê Elî” wekî nimûne bide ku ji Serhedê heta Diyarbekirê di nav dengbêjan de belav bûne. Keremê Elî yek ji wan kesên ji Zîlanê ye ku piştî qewamên li gelî rû didin li çiyayan bi qaçaxî digere. Pênc meh piştî Geliyê Zîla, ji hêla hêzên dewletê ve dîl tê girtin (Güneş & Şahin, 2019a: 95) û wî davêjin Hepisxaneyaya Erdîşê, lê ji hepisxaneyê derdixin û wî li “Kevirê Mara” (Gültekin, 2020: 128, 156; 2022: 61) an jî li gorî kilama Keremê Elî ya Şakiro li “Kaniya Mara” dikujin (Güneş & Şahin, 2019b: 95). Di kilamê de, di diyalogên bi çend kesan re û bi apê xwe re, em ji rewşa wî agahdar dibin ku Keremê Elî ji hepisxaneyaya Erdîşê şahidî û metirsiyên xwe tîna ziman (ji bo nîrxandîneke kilamê, bnr. Tosun, 2023: 275-281). Di dawiyaya hin varyantên kilama Keremê Elî de, dengbêj şîretan li ser jîbîrnekirinê “bîrîn”a Zîlanê dike. Varyanta ku dengbêj Nûroyê Meter bi vî rengî diqede:

li vê dinya derewîn, ez [...] hûn dimînin

temî û weşiyeta min li te be

herçî ku dîn û îman ji bonê hebe

tu car bîr nake bîrîna Geliyê Zîla

na welle kuştina Keremê Elî bavê Fadîmê, şahê xorta

de tu bala xwe bidê çolix û çocixê li serê van singûya

(Dengbêj Şakirê Kopê, 2018, 4:34)

Şîretên dengbêj ên li ser jîbîrnekirinê di varyantên din ên kilaman de jî xuya dikin û wate eynî bin jî ji aliyê derbirînê ve ferq di wan de çêdibin. Di varyanta Dengbêj Nûro de peyva “bîrîn”ê di varyanta Şakiro de wekî “kesîretî” derbas dibe. Herdu dengbêj jî di kilamên xwe de hin normên exlaqî tînin bîra guhdaran û van norman bi misilmanbûnê ve girê didin. Ji bo cimaeta guhdar krîterên herî giring, anga “dîn û îman” berpirsiyariyekê dide guhdaran û lê dixebite ku wan ji sûcê jîbîrkininê bi dûr bixe. Herwiha dengbêj, rola xwe jî bi rengêkî giring dinirxîne ji ber ku hem şertên misilmantiyê bi bîra civakê dixê hem jî ew bi kilamên xwe ve

berpirsiyariya xwe ya li ser bibîrxistinê tîne cih. Di kilamê de bi “referanseke dîni” ji guhdaran “tê xwestin [ku] bîreke civakî divê hebe û civak vê bûyerê her tim di bîra xwe da veşêre [da] ku neyê jibîrkirinê (Tosun, 2023: 280).

Di gotara fermî ya desthilatê de, temsîlên kesên mexdûr û “(h)êsîr” helbet bi vegêrana devkî û helbestî ya dengbêjan re li hev nake; du temsîlên cihêreng û nakok derdikevin meydanê. Li aliyê desthilatê gotarên ku di rojnameyên wê dewrê de tîne derbirin bi rengekî vederker û dîkeker ava dibin ku di wan de kesên li Zîlanê hatine qirkirin ne wekî merivan lê wekî heywan tîne resimandin û pêşkêşkirin (Özbilge, 2020: 118-141). Piştî karesateke ew çend mezin, desthilat bi rêya hêza medyayî ya wê dewrê dîrokeke bijartî di çarçoveya qayîmkirina amrazên desthilata xwe de pêşkêş dike. Lêbelê ji aliyê xwecihan ve ev temsîl, di vegêrana kilamê de bi hêla merivî ya qewamê bi exlaqî tê berçavkirin; xwediyê kiriyara xerab tê deximandin û xerabkirin, beramber vê, şîr û şopa wan a mekanî bi helbestî tê nimandin. Herwiha ev helwesteke wisa bi xwe re tîne ku lê dixebite redkirineke kolektîf li ser jibîrkirina qewamê saz bike, lêbelê rastiyeke ji li mexderê ye ku gelekî dijwar e meriv bîranîn û vegêranên kesên tepeserkirî (*oppressed*) xelas bike (Legg, 2005: 184-185).

4. Nêrînek li Leksîkografiya Vegêranan û Navguhertinên Bibîranînê

Binavkirin an jî raberkirina kiriyar û rewşên têkildarî Zîlanê yê ku di kilamên dengbêjan de an jî di xebatên li ser dîroka devkî de derdikevin mexderê tenê “fêhma hevpar” nîşan nadin, ew herwiha li ser “xwezaya şîdetê û failên wê” jî agahiyan didin meriv (Çelik, 2015). Dengbêj di ravekirina hin xalên li ser Zîlanê de hin nav û terman di kilaman de bi kar tînin ku di nav gel de jî qismek ji wan wekî beşeke termînolojîya li ser Zîlanê tîne bikaranîn. Ev peyv û têgeh bi vî rengî ne: “siyaset”, “(h)êsîr”, “qesabxane”, “her çar çilq”, “qir”, “ferman” û “kesîretî”. Peyva sereke ya ku qewama li Zîlanê bi giştî temsîl dike bi tevî paşxane, proses, kiriyar û encamê wê ve peyva “siyaset”ê ye. Ev peyv bi giştî wekî “Siyaseta Geliyê Zîla” an jî “Siyaseta Gelî” di nav xelkê de berbelav e. Hetta meriv rastî gelek îfadeyên wekî “wexta ku siyaset çêbû”, “berî siyasetê” û “piştî siyasetê” tê. Di diyarkirin û tayînkirina demê de siyaset wekî xala werçerxê tê dîtin û tiştên berî û paş wê pê tîne referekirin. Dema şahidê Geliyê Zîlan, Tahir Nas behsa vê peyvê dike wiha heber dide:

Niha çima dibêjin siyaseta gelî, çimkî siyaset dikirin. De siyaset dikirin, min ewil ji te re negot qaçax derketin serê çîya, mala millet, talana millet dibirin. Lewma siyaseta wan. Hikûmat li pey wan geriya ew jî kiribû sebab [...] Ew siyaset kirin, loma milletê me jî dibêje Siyaseta Geliyê Zîlan¹³ (Gültekin, 2020: 39).

Di hin hevpeyvînan de siyaset ji bo tevgerên qaçaxan, muxbiriyên bi niheqî hatine kirin û bi hinceta qaçaxan zirardîtina gelê deverê bi hev re girêdayî di çarçoveyê siyasî û kompleks de tê dîtin ku pê rehendê şîdet, aktor û aliyên şîdetê

13 Ev jêgirtin rasterast hate wergirtin, lêbelê di bernivîsandinê de diyar e ku hin midaxleyên zimanî lê hatine kirin. Diviyabû ku tu destwerdan li zimanê şahid nehata kirin.

û polîtîkayên wê dewrê bi giştî tîn temsîlîkirin. Şahidên ku meseleyê dinirxînin hin tîkiliyên rêvebirên herêmî û giregirên wê dewrê wekî kompoyekê difikirin ku hatiye/anîne serê wan. Bo nimûne, şahidê bi navê Abdurrahman Gurbuz, Edoyê Ezîzî û qaçaxên hevalên wî di meseleya Zîlanê de berpirsiyar dibîne ku bûne sebeb xelkê medenî jî zirarê bibînin. Ew di vê derheqê de wiha dibêje: “Edoyê Ezîzî qaçaxê aliyê Patnosê hat li ser qereqolê (Çaxirbeg) da, di nava rojê da çû serê qereqolê jêkir. Revî lê ket çû em jî ketine tira wî. Me çi kir?”¹⁴ (İtaliîk aidî min e, Gültekin, 2022: 45)

Di kilaman de xwecihên ku li Zîlanê mirine, zirarê dîtine an jî filitîne wekî “êşîrê geliyê Zîla” tîn behskirin. Peyva “(h)êşîr” hem ji ber destesergirtina xwecihên deverê tê bikaranîn ku hin ji wan ji bo hepsa Edeneyê hatibûn şandin, hem jî bo wê êş û kesîretiyê temsîl dike ku xelkê deverê wê demê kişandiye. Ne tenê di kilama Geliyê Zîlan de ev peyv derbas dibe ku jêr nimûneya wê hatiye dayîn, heman peyv di hin versiyonên kilama “Keremê Elî” de jî tê dîtin (bo nimûne bnr. Trtkurdimuzik, 2021, 5: 27).

ezê îro ji xelkê Geliyê Zîla ra bêjim **hêsîrê, hêsîrê, hêsîrê**

lawo bi şevê royê ez **hêsîrê** tazoxlanê Mala Şero Bavê Mizefer (Güneş & Şahin, 2019a: 48-49):

Herwiha Zîlan bi giştî di nav kilaman de wekî “qir” tê binavkirin, cihê ku kuştinên komî lê pêk hatine wekî “qesabxane” derdikeve pêş û herwiha peyva “ferman”ê jî di van kilaman de tê dîtin ku “ferman”a ermenî û êzidiyan jî tîne bîra meriv. Herwiha, di kilama Keremê Elî de behsa “herçar çilqê Geliyê Zîla” dibe ku ev têgeh temsîla çar eşîrên herêmê dike ku zirarê gihîştîye wan: hecîdêrî, hemoyî, bekirî, îskî. Xêncî van xalên jorîn, hin toponîmên li Zîlanê hene mekanên sereke ên “qesabxane”yan destnîşan dikin ku hin ji wan di kilaman de jî derbas dibin: Newala Fedê, Ada Xeybê (İşler, 2015: 31; Gültekin, 2022: 173) û Newala Kuştîyan. Li gorî agahiyên ku Sadik Varlı dide, navê esas yê “Newala Fedê” berê “Newala Komirê” bûye, xelkê piştî Zîlanê ev navê nû lêkiriye. Dîsa li gorî gotina wî navê esas yê “Ada Xeybê” berê “Cebelî” bûye ku piştî Zîlanê xelkê deverê navê wê guherandiye (Gültekin, 2023: 94). “Li gorî efsaneyekê, kesên hatine kuştin bi êvaran hatine vê herêmê di destê wan de ronahiya kesk hebûye. Dema ku şivan wan dibînin bawer dikin ev kesên wînda bi şev tîn li herêmê digerin... ji ber vê, navê wê derê bi watêya adaya windayîyan jê re Ada Xeybê hatiye gotin” (Gültekin, 2023: 94). Meriv dibîne ku piştî Zîlanê vegêranên bawerî û efsaneyên gelêrî çêbûne. Xaleke girîng û balkêş

¹⁴ “Ketin tira kesekî” ango ketin belaya kesekî. Li vir xwecihê bi navê Abdurrahman Gurbuz serdagirtina Edoyê Ezîzî ya qereqolê wekî sebebê Zîlanê dibîne û dinirxîne. Hêjayê gotinê ye ku di wan kilaman de ku li ser Edoyê Ezîzî hatine çêkirin, ew wekî “mêrê mêrxas” derdikeve pêş. Hetta di kilameke Keremê Elî de ku Dengbêj Mistefayê Cangoranê dibêje, ji bo xilaskirina Keremê jî hepisxaneyê hawar û gazî li Edoyê Ezîzî jî tê kirin: “kesekî xudanê xêra tune / cabekî Kor Husêyn Paşa Bavê Evla Begê ra bişîne / Cabekê bide Edoyê Ezîzî mêrê mêrxas / bira were destê Keremê Elî bigirê / ji hepisê birevine birîndaro hê yê birînxedaro hê yê” (Trtkurdi, 2020, 6:30). Ji bo nirxandina kilama Edoyê Ezîzî ya Dengbêj Nuroyê Meter, bnr. Daratî, 2023:140-145.

ji ew e ku hin navên war û mekanên qewamê ji aliyê xelkê deverê bi xwe ve hatine guhertin.

Navguhertin bi gelemperî ji aliyê desthilatan ve pêk tê û kiryareke siyasî ye ku gelek xemên cihêreng dixwe.¹⁵ Ev navên ku li navendên bajaran ji bo bibîranîna (*commemoration*) kes an jî qewamekê tên bikaranîn, navên kolanan û versiyona dîroka ku ew di qada giştî de didin nasandin ku aidî nasnameya neteweyî û binyatên hêz û otorîteyê ne, dîroka fermî dixin nav torên danûstandinên civatî (Azaryahu, 2009: 53) û ev navên bîranînê bi gelemperî di nav neteweyên rûdinyayê de ji aliyê hêz û desthilatên siyasî ve tên dayîn. Lêbelê, di nimûneya “Ada Xeybê”, “Newala Fedê” û “Newala Kuştîyan” de, hêz û desthilateke fermî an jî neteweyî lê kar nekiriye û nav neguherandiye, hêza ku nav guherandiye ew bîra hevpar a gel bi xwe ye ku nimûneyên bi vî rengî kêman in. Fonksiyona van navên ku bi amanca bîranîna şexsiyet û rûdanên mezin hatine dayîn, dişibe ya muzexane, abîde, avahî, park, rêûresman ku bîra kom û cemawerê bi meriv dide hisandin (bnr. Alderman, 2000; Rose-Redwood, 2008; Hoelscher & Alderman, 2004). Çawa ku navên di kilaman de li dû hevdu rêz dibin, wê rûdan/qewamê bi bîr dixin û nahêlin ji bîran biçê, wisa jî rasterast guherîna navan a ji aliyê gel bi xwe ve ya têkildarî qewamên li Geliyê Zilan tesîrekê li ser gel çêdike û bi wî awayî “dîroka bibîrxistî dibe tecribeyeke bi awayekî çandî parvekirî” (Azaryahu, 2009: 54). Ev navguhertina xwemalî û tabîî ku ji aliyê gel ve pêk tê di gewher de kiryareke bibîrxistinê ye, mîna guhertinên toponîmîk ên bi destê desthilatê pêkhatî bi motîvasyonên nasname, netewesazî û bêdengkirina toponîmîk ranabe. Ew hem masûmane ye hem jî bîra li ser qewamê zindî dihêle.

Encam

Vegêranên devkî yê behs û babeta wan qewamên raboriyê yê sereke ne û bi awayê dîrokbêjîyê tên neqilkirin di çanda devkî ya kurmançî (dengbêjî) de cihêkî berfireh digirin. Ew danûstandinên di navbera civaka kurdî û raboriyê re ava dikin û bi wan re pêwendîdariyeke xurt û berdewam dirust dikin, bi gotineke deqîqtir bi qewlê Pierre Nora ew *lieux de mémoire* ava dikin. Ev mekanên bîrê yê ku di kilaman de bi rêya gelek navan tên vegêran herwiha rê û rêkarên alternatîf jî bi xwe re pêşkêş dikin ku pê civat bi rengê berxwedêr dikeve wê hewlê seba ku raboriya xwe ya hevpar bi cemawerî bi bîr bîne û nehêle ku duçarî jibîrkirinê bîn. Navên li dû hevdu rêz dibin ên wekî *Zozanê Sûtê*, *Kaniya Dîdarê*, *Delavê Hêrîşoyê* yê ku ji aliyê xwe yê peyvî/wateyî ve sêwirandinên jiyana pastoral a kurdî dixin bîra meriv di heman demê de dibin ew cih û warên ku mekanên bîrê di serê guhdaran de disêwirînin. Dengbêj wan cih û warên ku lê qewimînên trawmatîk pêk hatine dixê bîra civakê û şîna kesên mirî dike, bîr(anîna) wan kesan di bîreweriya civakî de tomar dike da ku *heta dinya xweş ava be ew êş* û kesîretiya ku wan dîtiye her bimîne û bi bîr bê. Ji ber ku ji bo derbirîna bîranînê, ew cih û warên giring in, bi

15 Bo navguhertinên li Tirkiyeyê, bnr. Üngör (2016: 339-414).

rêya vegêrana devkî ya hunerî bi taybetî rûmeta wan kesan tê teslîmkirin ku bûne qurbanîyên tundiyê.

Mebesta wan cih û mekanên bîrê li gorî Nora dibe “daxwaza bibîranînê” û herwiha ew dixwaze “demê bide rawestandî û rêgîriyê li karê jîbîrkirinê bike” (1989: 19). Ev rêgîriya ku ji karê jîbîrkirinê re tê kirin di kilama dengbêjan bi xwe de rasterast tê vegotin. Wate, babeta jîbîrkirinê an jî jîbîrmekirinê di nava kilama xwe de vedigêre û rola xwe ya bibîrxistinê ne tenê bi vegêranî herwiha bi awayekî dîdaktîk jî radigihîne û dibêje “herçî kesê ku navê wî musulman be / dîn û îman jî bonê hebe / heyanî dunya xweş ava be / ewê rûnê malxirabo ji bîr nake kesîretiya Geliyê Zîla” (İbrahim Şahin & Ömer Güneş, 2019, 3: 17). Meriv dikare bibêje ku kilamên kurmancî wêneyên balkêş û estetîk ên raboriyê dikêşin û herwiha ew “derûniya millet” (Celîl, 2023: 39) dikarin hin agahiyên têkildarê qewamên raboriyê pêşkêş bikin. Herwiha di vê xebatê de hate dîtin ku hin navên cihan ên ku di kilaman de derbas nabin piştî Zîlanê rastî guherînê hatine û ev guhertin rasterast ji aliyê gelek bi xwe ve hatiye kirin ku meriv wan dikare di çarçoveya bibîranînê (commemoration) de binirxîne. Lewra, ew her cara ku tên bikaranîn hem qewamê jî bi bîr dixin hem jî nîrxên hevpar ên hizrî ku aidî civatê ne derdixin meydanê.

Çavkanî

- Alakom, R. (2020). *Hoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta.
- Alderman, D. H. (2000). New Memorial Landscapes in the American South: An Introduction, *The Professional Geographer*, 52(4), 658–660.
- Aras, A. (2018). *Şairê Kurda yê Efsanewî: Evdalê Zeynikê*. Stenbol: Nûbihar.
- Aslan, M. (2022). Analîza taybetmendîyên hunera dengbêjîyê, *Folklor û Ziman*, 3(1), 39-66.
- Azaryahu, M. (2009). Naming the Past: The Significance of Commemorative Street Names, in Berg L. D. and Vuolteenaho, J. (eds) *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. Aldershot: Ashgate, 53–70.
- Basso, K. (1996). *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache*. Albuquerque: University of New Mexico Press.
- Blumenfeld, E. R. (2011). Poetry of witness, survivor silence, and the healing use of the poetic, *Journal of Poetry Therapy*, 24(2), 71-78.
- Bretéque, E. A. D. L. (2012). Voices of sorrow: Melodized speech, laments, and heroic narratives Among the Yezidis of Armenia. *Yearbook for Traditional Music*, 44, 129–148.
- Celîl, O. (2023 [1985]). Serhildana Araratê ya Kurdan a sala 1930yê û salixdana wê di stranên dîrokî de (Amadekar: Mustafa Kilicaslan), *Nûbihar*, 27 (163), 36-42.
- Connerton, P. (2009). *How Modernity Forgets*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Çaçan, S. R. (2013). *The Dengbêjî Tradition among Kurdish Kurmanj Communities: Narrative and Performance during the late Nineteenth and Twentieth Centuries*, Master’s Thesis, İstanbul: Boğaziçi University.

- Çelik, A. (2015). Eşîra Xiyar, Bîra Kolektîf û Trawma: Êşeke Patetîk li dor Kilama Reben im', *Wêje û Rexne*, (4), 180–202.
- Çelik, A. (2015). Înkâr deşîl îkrar: 1915'in Kûrtçe'deki Adları, *Kûrt Tarihi*, (18), 30-33.
- Çelik, C. (2017). Toplumsal Hafîzanın İnşasında İsimler, *Sosyoloji Divanı*, (10), 63-75.
- Darati, S. R. (2023). *A World through Words: Dengbêjî, Kilam and Collective Memory*, Teza Doktorayê ya Neçapbûyî, Göttingen: Zanîngeha Göttingen.
- Delikaya, Ö. & Ertekin, M. Z. (2021). "Li Geliyê Çatê Tav Dizirîqî": Topogeny û Nexşeya Devkî di Kilama Elî Xarza de, *Kurdiyât*, (3), 11-25.
- Delikaya, Ö. (2021). *Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkiyeyê: Mînaka Agîriyê*, Teza Doktorayê ya Neçapbûyî, Enstîtuya Zimanên Zindî, Çewlîg: Zanîngeha Bîngolê.
- Dengbêj Şakîrê Kopê. (2018, 14 Hezîran). Dengbêj Nûro – Keremê Elî [Vîdeo]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=gh2Zhmgd4Yg>
- Edkins, J. (2003). *Trauma and the Memory of Politics*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Feld, S., (1996). Waterfalls of Song: An Acoustemology of Place Resounding in Bosavi, Papua New Guinea, in S. Feld & K. Basso (eds) *Senses of Place*. Santa Fe, NM: School of American Research Press, 91–135.
- Fernández, S. I. (2022). The Commemorative Power of Govend Dances for a Kurdish Community in Transition. *the World of Music (new Series)*, 11(2), 91-111.
- Fox, J. J. (2006). Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names, in Fox, J. (ed.) *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*. Canberra: Pacific Linguistics, Research School of Pacific and Asian Studies, Australian National University, 89–100.
- Gültekin, M. (2013). *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. Stenbol: Avesta.
- Gültekin, M. (2020). Bandora Hûnera Dengbêjîyê Di Avabûna Nasnameya Netewî Da, *Kûrt Araştırmaları Dergisi*, (4), 165-174.
- Gültekin, N. (2020). *Şahidekî Komkujîya Geliyê Zîlan Tahir Nas*. Stenbol: Lîs.
- Gültekin, N. (2022). *Ezmanê Sor Şahidên Komkujîya Geliyê Zîlan 1930*. Stenbol: Doz.
- Gültekin, N. (2023). Mehmet Sadık Varlı: Ji bermahiyên tevkujiyê kesên av bi wan germ bibe şandine Girtîgeha Edeneyê!, *Nûbihar*, 27 (163), 89-96.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2019a). *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2019b) *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2021) *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno*. İstanbul: Nûbihar.
- Halbwachs, M. (2017). *Kolektif Hafîza*. (Banu Barış, çev.) Ankara: Heretik.
- Hamelink, W. & Barış, H. (2014). Dengbêjs on Borderlands: Borders and the State as Seen through the Eyes of Kurdish Singer-Poets, *Kurdish Studies*, 2 (1), 34–60.

- Hamelink, W. (2016). *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation*. Leiden: Brill.
- Helleland, B. (2012). Place names and identities. In B. Helleland, Ore, C.E. and S. Wikstrøm (eds) *Names and identities*. Oslo: University of Oslo, 4(2), 95–116.
- Hoelscher, S. & Alderman, D. H. (2004) Memory and Place: Geographies of a Critical Relationship, *Social and Cultural Geography*, 5(3), 347–355.
- Hoelscher, S., & Alderman, D. H. (2004). Memory and place: Geographies of a critical relationship. *Social & Cultural Geography*, (5), 347–355.
- Hynes, S. (1999). Personal narratives and commemoration. In J. Winter & E. Sivan (Eds.), *War and remembrance in the twentieth century*. Cambridge, UK: Cambridge University Press, 205–220.
- İbrahim Şahin & Ömer Güneş. (2019, 28 Kanûna Pêşîn). Dengbêj Şakiro – Keremê Elî [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=1TeUK_4X2bg
- İşler, İ. (2015a). *Zilan Dosyası-1*. Ankara: Sítav.
- İşler, İ. (2015b) *Zilan Dosyası-2*. Ankara: Sítav.
- Johnson, N. C. (2004). “Public memory”, In Duncan, J.S., Johnson, N.C. & Schein, R. H. (eds) *A companion to cultural geography*. Malden, MA: Blackwell, 316–327.
- Kaplan, Y. (2023). Ji Edebîyata Devkî ya Kurdî Serhatîyek Evînî: Salih û Kejê û Deqeke Çapkirî. *Mukaddime*, 14 (2) , 416-442.
- Kardaş, C. (2019). The Legacy of Sounds in Turkey: Âşîks and Dengbêjs’ in Özdemir, U., Hamelink, W. And Greve, M. (eds) *Singer-Poet Traditions in Eastern Anatolia*. Baden-Baden: Ergon Verlag, 37–51.
- Kaynar, C. (2018). Di dengbêjiyê de li dor temaya şer û kuştinê nixandina kilamên şînê. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 3 (2), 65-94.
- Laub, D. (1995). Truth and testimony: The process and the struggle. In (ed.) C. Caruth, *Trauma: Explorations in memory*. Baltimore: Johns Hopkins University Press, 61–75.
- Legg, S. (2005). Sites of counter-memory: The refusal to forget and the nationalist struggle in colonial Delhi. *Historical Geography*, (33), 180–201.
- Nora, P. (1989). Between memory and history: Les Lieux de Memoire. *Representations*, (26), 7–24.
- Nora, P. (1996). Preface: From Lieux de mémoire to Realms of Memory. In L. D. Kritzman (Ed.), & A. Goldhammer (Trans.), *Realms of Memory: Conflicts and divisions (XV–XXIV)*. Columbia University Press.
- Oliveira, K. R. K. N. (2009). Wahi a Kahiko: Place names as vehicles of ancestral memory. *AlterNative: An International Journal of Indigenous Peoples*, (5), 101–115.
- Osman Taş-Muşiya, (2022, 6 Çiriya Paşîn). Muş'lu Ailenin Acı olayı Dengbej Hüseyino Heyder min Lawo [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=cy5dfJuOthk>
- Özbilge, N. (2020). *Çekirgeler, Kürtler ve Devlet: Erken Cumhuriyet Dönemine Yeniden Bakmak*. İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.

- Rose-Redwood, R. S. (2008) 'Sixth Avenue is now a Memory': Regimes of Spatial Inscription of the Performative Limits of the Official City-text, *Political Geography*, 27(8), 875–894.
- Schäfers, M. (2019). Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey, *Comparative Studies in Society and History*, 61(2), 447–473.
- Sharifi, A. & Barwari, Z. (2020). The Oral Tradition of Dengbêjî: A Kurdish Genre of Verbal Art and Reported Speech. In A. Korangy (Ed.), *Kurdish Art and Identity: Verbal Art, Self-definition and Recent History*. Berlin, Boston: De Gruyter, 136–168.
- Smith, L. T. (2021). *Decolonizing Methodologies. Research and Indigenous Peoples*. London: Zed Books.
- Söylemez, K. (2021). Ji bihuştê Serhedê dengbêjek: Evdîrehmanê Perê (1933-2008). *Nûbihar*, 25 (156), 34-40.
- Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajedîya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî. *Mukaddime, Özel Sayı - Klasikten Moderne Aşk Mefhumu*, 148-176.
- Taş, F. (2022). *Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler*. İstanbul: Çizgi Kitapevi.
- Till, K. E. (2003). Places of Memory. In Agnew, J., Mitchell, K. & Toal, G. (eds) *A Companion to Political Geography*. UK: Blackwell.
- Tosun, T. & Kardaş, C. (2022). Di Bin Sîya Bîra Civakî da Kilama "Asyayê" û Serpêhatiyên Ferzende Beg, *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7(1), 43-66.
- Tosun, T. (2023). *Bîra Civakî di Kilamên Dengbêj Şakiro da*, Teza Doktorayê ya Neçapbûyî, Enstîtuya Zimanên Zindî. Çewlîg: Zanîngeha Bîngolê.
- TrtKurdi. (2020, 18 Gulan). Dengbêj Mistefayê Cangoranê – Keremê Elî [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=UoottQYID4E>
- TrtKurdiMuzik. (2021, 1 Çiriya Paşîn). Dengbêj Ferîdê Agiriyê – Keremê Elî [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=zri16NyMkIE>
- Ulugana, S. (2012). *Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı (1926-1931)*. İstanbul: Perî Yayınları.
- Ulugana, S. (2013). Gıdıkzadeler ve Milisliğin Kısa Bir Anatomisi, *Kürt Tarihi*, (5), 48-53.
- Üngör, U. Ü. (2016). Modern Türkiye'nin İnşası: Doğu Anadolu'da Ulus, Devlet ve Şidet (1913-1950). (Ali İhsan Dalgıç, çev.) İstanbul: İletişim.
- Yüksel, M. (2016). On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra, *Middle Eastern Studies*, 52 (4), 656–676.
- Yüksel, M. (2019). Dilşa'nın Babasına Ağıt: Ruslar, Dengbêjler ve Bulanık Savaşı, içinde Çağlayan, E. (ed) "Burası Muştur": *Tarih, Toplum, Kültür ve Edebiyat*. İstanbul: Pınar Yayınları, 325–358.
- Yüksel, M. (2023). Besra, Zarife, Gulnaz ve Diğerleri: Arşiv Belgeleri ve Kürtçe Sözlü Anlatılarda Kadınlar. *Toplumsal Tarih Akademi* (3), 136-141.
- Zeraq, D. (2020). Bejara Polîtîk di Kilamên Şakiro da <https://diyarname.com/news.php?idx=48496>
- Zeraq, M. (2022). *Rengê Hebûnê*. Stenbol: Lîs.

Pêvek: Dengbêj Nûroyê Meter, Kilama “Keremê Elî”

hayî

lê dayê hê lê dayê lê dayê lê dayê wax lê dayê lê dayê lê dayê lê dayê

ax de lêê bi sê dengan ba dikirî Dîdarê rebenê sibe ye lawo

bihar e xelkê li rabû tevdirê

dilê min bi kul e bi keder e bi elem e

dilê min ji halê dilê min mêze kir

dayê rebenê sibe ye dilê min ji halê dilê min mêze kir

min ê xwe jor da berdabû wêrana Erdîşê ber cama vê pencerê

min bi çavê serê xwe dîtibû Keremê Elî bavê Fadîmê şahê xorta

weyla li min korê sekinî ser derd û kul û meraqê dinyalikê

li ber cama vê pencerê simbêlê sor hine kir

ax di ber ra derbas bûm mi go Keremo lawo ev çî derman bû

te yê ser da li simbêla xwe kir

derd û kul û meraqê dinyalikê pir hindik bûn

go apo agirê kulê di mala te keto

heyfa min nayê li wê heyfê, heyfa min tê li wê heyfê

tirkê Pilûrê Pilûrvankê Xergînê Werdîşê sekinîn ber cama vê pencerê biraziyê te

temaşê kir

lê lê malşewitiyo de tu bala xwe bidê

Îdrîsê Cewar Efendî na welle tevî kuçikê Dewrêş Begê

sekinîn nava çarsiyê da diçûn dihatin xwe ra meş kir

diçûne ber derê qereqola cendirma sekinîn

mi bala xwe dayê ser hev da digotin kesî nedî bi hev re muşewre kir

teresê Dewrêş Begê nav di cendirma da go lawo herin ser cinazê Keremê Elî ra

bisekinin derba qedayê lêxin

hey mala te şewitiyo de tu bala xwe bidê em jî bizarin

me yê herçar çilqê Geliyê Zîla, çilqa hemo ra em bizarin em ê ji xwe ra heyfê vekin

wax hey

germa mîrata Heyderbegê zor bû apo birîna

biraziyê te pir xedar bû wê germê timî caran li can û bedenê mi eser kir

heyfa mi nayê wê heyfê heyfa mi tê li wê heyfê

de tu bala xwe bidê

ser derd û kul û meraqê dinyalikê ra ez birîndar im

tirkê Erdîşê Xergînê simbêla xwe bada timî cara li biraziyê te temaşê kir

ax birînkûra te me looo

derdgeran im birînkûr o birîndarê mala bavê xwe tenê me hêyê way way way...

lê dayê lê dayê lê dayê ay

Dîdarê kire gazî go Hacerê gulîbirê

sibe ye lawo dilê min ji halê dilê min tirsiya

lê lê dayê rebenê sibe ye dilê min ji halê dilê min tirsiya

min berê xwe dabû wêrana Erdîşê
li devê mepûsханê sekinîbûm
min kiribû pîrsa Keremê Elî bavê Fadîmê şahê xorta
berdevkê ber devê mîran û hakîma qeytanek ji qeytanê dora wan şewqîya
min dît zelamekî xudanê xêr hatibû li ser darê piya
go Dîdarê korayî di çavê te da hatê
xwe jor da berde mîrata Heyderbegê na welle hewşa Îdrîsê Cewar Efendî
nava laş û cinazê egîda fêrisa xweşmêra niştemana van cindiya
min ê berê xwe dabû wêrana Heyderbegê
ez geriyabûm nava cinazê egîda fêrisa xweşmêra niştemana van cindiya
mi dî kekê mi birîndar e timî cara bi sê derbên bêxweyîyê çapiliya
xwîna reş vê sibengê niqûtî xwîna sorîgevez dakete ser simêlê palikê simbêlê
elfazê şekir xala di rîya
lo lo birîndarê mala bavê min egîda Xwedê pir gelek in
nexweş û birandarê vê sibengê di nava cîya
ez ê rabîm melhemekê ji birîndarê mala bavê xwe ra çêbikim bi danzde cîya
na welle çêbikim timî cara vê sibengê bi kevçîya
nexweş û birîndarê mala bavê mi rebena Xwedê pir gelek in
nexweş û birîndarê [...] ¹⁶
li vê dinya derewîn, ez [...] ¹⁷ hûn dimînin
temî û weysîyeta min li te be
herçî ku dîn û îman ji bonê hebe
tu car bîr nake birîna Geliyê Zîla
na welle kuştina Keremê Elî bavê Fadîmê şayê xorta
de tu bala xwe bidê çolix û çocixê li serê van singûya
ez birîndara birayê xwe me hêyê
weyla birînkûro derdgirano hêêê li min hêyê
(Dengbêj Şakîrê Kopê, 2018, 4: 34)

¹⁶ Deng qut dibe.

¹⁷ Deng qut dibe li vir, lê dibe ku “dimirim” be.